

**Rapora
Mafên Ziman û
Tenduristiyê**



Çavdêriya Mafên Zimanî û Çandî

Rapora Mafên Ziman û Tenduristiyê

Savaş DEDE

Wergêr: Omer Fîdan

Amed, Berfanbar 2020

ÇAVDÊRIYA MAFÊN ZIMANÎ Û ÇANDÎ

Rapora Mafên Ziman û Tenduristiyê

Amed, Berfanbar 2020

Nivîskar:

Savaş Dede

Edîtor:

Ulaş Güldiken

Werger:

Omer Fîdan

Mijanpaj:

Zafer Tüzün

Tora Ziman û Çanda Kurdî

Diclekent Mah. Selahattin Eyyubi Bul. Altın-4 Sitesi C Blok Altı No:53/E
Kayapınar - Diyarbakır

Web: www.torakurdi.org
E-mail: info@torakurdi.org
Tel: 0549 660 22 21



Ev weşan di çarçoveya Bernameya YE Etkiniz de, bi piştevaniya Yekitiya Ewropayê pêk hatiye. Ji naveroka vê weşanê tenê Komeleya Berê Her Tîştî Zarok berpirsiyar e û bi ti awayî fikrên Yekîtiya Ewropayê temsîl nake.

Naverok

<i>Kurte</i>	6
<i>Destpêk</i>	8
Armanc	9
Komên Hedefkirî	10
Sînorên Erdnîgariya Xebatê	10
Çarçoveya Hiqûqî ya Mafên Zimanî û Tenduristiyê	10
Di Hiqûqa Navneteweyî de Tenduristî	10
Saziya Tenduristiyê ya li Tirkiyeyê	12
Têkoşînên Alternatîf ên li Dijî Polîtîkayên Tenduristiyê yê li Tirkiyeyê	13
Rêbaz	14
Pirsgirêkên Derbarê Mafên Ziman û Tenduristiyê de	15
Pirsgirêkên Aktorên Civaka Sivîl	19
Pêşniyazên Çareseriyê yê ji bo Mafên Ziman û Tenduristiyê	20
Pêşniyazên ji bo Reformên Siyasî	20
Pêşniyazên ji bo Aktorên Civaka Sivîl	21
<i>Encam</i>	23
<i>Çavkanî</i>	24

Kurte

Ev xebat ji bo destnîşankirina têkiliya di navbera tenduristî û zimanê dayikê de, wexta ku polîtîkayên tenduristiyê zimanê dayikê paşguh dikin, di qada mafên mirovan de binpêkirinên çawa pêk tînin,

Daneyên xebatê bi rêbazên hevpeyvîn û civînên koma fokûskirî hatine bi dest xistin. Hevdîtin bi 22 kesan re ku ji bajarên Amed, Colemêrg, Mêrdîn, Wan, Stenbol, Enqere û Tekirdagê ne hatine çêkirin.

Ji bo pêkanîna beşa teorîk a raporê ji peymanên navneteweyî yên ku di bin banê Neteweyên Yekbûyî û Konseya Ewropayê de hatine morkirin û ji destûra bingehîn a Komara Tirkiyeyê ya 1982yan sûd hatiye wergirtin. Dîsa di vê beşê de xebatên ku di bin banê saziyên civaka sîvîl (SCS) de û bi însiyatîfa takekesî hatine kirin jî li ber çavan hatine girtin.

Hevdîtinên ku hatine kirin di wan de hatiye destnîşankirin ku ji ber polîtîkayên tenduristiyê yên heyî û pêkutiyên li ser zimanê dayikê ev pirsgirêk derketine holê:

a. Nexweş di xwegihandina bi xizmetên tenduristiyê de zehmetiyan dikişînin; hemû pêvajoyên tedbîrên parastinê, pênasekirin, tedawî û şopandinê jî ji van neyîniyan bandor dibin.

b. Li Tirkiyeya îroyîn a ku di xizmetên tenduristiyê de gihîştina bi standardên jiyane pir zehmet e, pêkutiya zimanê fermî dike ku zimanên din ji qada giştî bîndûr xistin. Wek encam, di serî de kal û pîr û jin, di qada taybet de kêmar tengav dibin.

c. Polîtîkayên heyî dikin ku takekes di navbera çand û zimanê xwe û pêkutiya zimanê serdest de asê bibin. Ji ber pirsgirêkên wekî ku perwerdehiya bi zimanê dayikê ji aliyê dewletê ve nayê dayîn û di perwerdehiya tenduristiyê de yekzimanî heye, ev yek dike ku mirov hem nekarin zimanê xwe û hem jî zimanê serdest bi awayekî kartêker bi kar bînin.

d. Çawa ku polîtîkayên ziman di navbera serdest û kêmaran de hiyerarşiyekê çêdike, dike ku hinek kêmar jî bi fikar nêzî xizmetên teknîkî yên ku bi zimanê wan tînin dayîn, bibin.

e. Ji ber ku takekes nikarin xwe derbirin an jî ji ber ku “Kurd tên dîtin” rastî ji derve hiştinê tên.

Ji bo ku ev pirsgirêkên li jorê bên çareserkerin, pêşniyazên reformên siyasî û pêşniyazên ji bo saziyên civaka sîvîl bi vî awayî ne:

a. Zimanên din ên ji derveyî Tirkî divê xwediyê statûyeke fermî bin.

b. Divê bi van zimanan perwerdehiya tenduristiyê ya bingehîn bê dayîn.

c. Divê zimanê dayikê bi awayekî ku dahateke aborî pêk bîne di nava civakê de bê bikaranîn.

d. Ne bi tenê ziman, vegotinên simbolîk ên din jî (tabela, planên saziyan, nasnavên berpirsan, hwd) bi awayekî ku serdêrên saziyên tenduristiyê bikarin sûdê jê wergirin bên sererastkirin.

e. Ziman divê wek mafekî xwezayî bê dîtin û li daxwazên di vê qadê de pêkutî neyên kirin.

f. Divê rêxistinên civakî yên sîvîl hevkarîyê bikin, ji bo ku agahî û belgeyên qadê bên parastin û mirov bi hêsanî bikarin xwe bigihîninê, bi baldarî tevbigerin.

g. Yek ji kêmasiyên herî mezin ên di qada tenduristiyê de jî tunebûna çavkaniyên bi zimanê dayikê ye. Bi taybetî divê di vê qadê de çavkaniyên teknolojîk bên zêdekirin.

h. Divê akademiyeke tenduristiyê ya ku bi Kurdî perwerdehiyê bide û xebatan bike bê damezirandin.

i. Divê mafê zimanê dayikê di hemû xebatan de wek *pêşmerc* bê dîtin.

Destpêk¹

Dema ku tenduristî tê gotin tiştê ku pêşiyê tê gotin rewşa kes a tenduristbûnê ye. Ev yek jî dike ku tenduristî bi awayekî teng² bê famkirin; dike ku aliyên tenduristiyê yên derûnî, çandî, civakî, aborî û heta siyasî jî bên paşguhkirin. Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî³ tenduristiyê wek “pîvaneke jiyane”; rewşa netenduristbûn a fîzîkî jî wek “pirsgirêka ewlehiya takekes” dinirxîne. Di Destûra Bingehîn a Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê de jî tenduristî wek “ji aliyê fîzîkî, derûnî û xweşahiya civakî ve rewşa başbûnê” pênase dike.⁴

Li gor Man û hwd. têkiliya di navbera tenduristî û mafên mirovan de dikare di bin sê serenavan de bê nirxandin.⁵ Ji vana ya yekemîn bandora polîtîkayên tenduristiyê, sepan û bernameyan a li mafên mirovan e. Ji bo vê yekê jî destnîşankirina pirsgirêkan, ji bo çareserkirina pirsgirêkan destnîşankirina polîtîkayan û sepandina wan pêwîst e. Bandora bînpêkirina mafên mirovan a li ser tenduristiyê jî sernavê duyemîn e. Ev rewş dibe ku ji ber sepanên fîzîkî yên wek îşkenceyê pêk bê, bi heman awayî dibe ku ji ber bînpêkirina qedexekirina cudahiyan jî derkeve holê. Têkiliya sêyemîn a di navbera tenduristî û mafên mirovan de jî destnîşankirina têkiliya rasterast a di navbera pêşketina mafên mirovan û tenduristiyê de ye.

Wek ku Man û hwd. jî gotine, mijarên serenava yekemîn bi polîtîkayên ku di qada giştî de bînan sepanandin pêkan in. Lê dema ku mirov Plana Stratejîk a Wezaretê Tenduristiyê vedikole⁶ tê dîtin ku di amadekirina polîtîkayên ten-

1 Ji ber piştgiriyên wan ên hêja, spasîyên xwe pêşkêşî Dr Cuma Çiçek, Cewahir Sadak Duzgun, Omer Fidan, Erdal Sîpan, û kesên ku beşdarî hevpeyvîn û hevdiîtinên civînên koma fokûskirî bûne dikim.

2 Wateyên tenduristiyê yên teng û fireh bi wateya teng û fireh a ji şîroyê hiqûqî cudatir e. Lewra wateya teng naveroka pîvanê û wateya fireh jî mafê ku qada wê ya kakilê destnîşan dike di hundirîne. (Oder, Bertil Emrah. 2010. *Anayasa Yargısında Yorum Yöntemleri*. İstanbul: BETA. r. 24-25) Mafê tenduristiyê jî wek skalayê ku ji tenduristbûna fîzîkî ber bi pîvanên jiyana tendurist ve fireh dibe di hundirîne. Her du aliyên skalayê jî ber ku dikarin bandorê li hev bikin, ne pêkan e ku mirov behsa kakilekî bikin.

3 United Nations. 1948. Universal Declaration of Human Rights. Madde 25. <https://www.un.org/en/universal-declaration-human-rights/>

4 World Health Organisation. 1948. Constitution Of The World Health Organization. Dibace. https://www.who.int/governance/eb/who_constitution_en.pdf

5 Man, Jonathan M., Lawrence Gostin, Sofia Gruskin, Troyen Brennan, Zita Lazzarini, ve Harvey V. Fineberg. 1994. «Health and Human Rights.» *Health and Human Rights* 1 (1): 6-23.

6 T.C. Sağlık Bakanlığı. 2019. *2019-2023 Stratejik Planı*. T.C. Sağlık Bakanlığı.

duristiyê de zimanên kêmaran li ber çavan nehatiye girtin. Di aliyê din de jî aşkerekere ye ku dê polîtîkayên yekzimanî yên lêkolîn û vekolînê yên ku ji bo destnîşankirina pirsgirêkan pêwîst in dê kêmbimînin.⁷ Hevdîtinên ku hatine kirin di wan de hatiye gotin ku di pêvajoya sepandina polîtîkayên tenduristiyê de jî xizmeta tenduristiyê ya yekzimanî dibe sedema pirsgirêkên ku digihîjin asta binpêkirina mafên jiyane.

Di hiqûqa mafên mirovan a navneteweyî ya heyî de berpîrsiyara/ê binpêkirinên mafan ne takekes, dewlet e.⁸ Wek mijarên mafê jiyane yan jî qedexeya îşkençeyê “*Sepanên zimanî yên ku takekesan bi awayekî bê sedem û kêfî dixewşeke dijawantajê dibe sedema vederkirina wan*”⁹ jî dibin sedema cudakariyê û tekane berpîrsiyara vê rewşê jî dewlet e.

Binpêkirinên mafên mirovan bi tenduristiyê re di nava têkiliyêke bazinî de ne. Binpêkirin pirsgirêkên têkildarî tenduristiyê zêde dikin, polîtîkayên tenduristiyê yên kêmbimîn, çewt an jî qestî jî zêdetir dibin sedema binpêkirinên mafan. Li cihê ku dewlet bi awayekî bi pergal mafê zimanê ku mafê mirovê herî bingehîn e binpêdike, mirov nikare behsa tenduristiyê gel¹⁰ bike.

Armanç

Li Tirkiyeyê pirsgirêkên ku rejîma yekzimanî afirandine di serî de perwerdehî, kirine ku di hemû qadên jiyane de binpêkirinên têkildarî mafên mirovan ên bingehîn çêbin. Ji ber ku tenduristî mijara *pîvana jiyane û ewlehiya kesê*, dema ku bi hemû pêkhatayên xwe di wateya berfireh de bê nixandin, ji binpêkirina mafê jiyane bigire, heta bi awayekî ne wekhev belavkirina çavkaniyên giştî dibe sedema gelek binpêkirinên mafan.

Biryar hatiye wergirtin ku Komeleya Berî Her Tiştî Zarok bi hevkarîya Tora Ziman û Çanda Kurdî û bi piştgiriya EtkinîzABYê di çarçoveya Projeya Çavdêriya Mafên Zimanî û Çandî de ya ku dimeşîne şeş raporên tematîk amade bike. Ji van temayan yek jî “Mafên Ziman û Tenduristiyê” ye. Ev raporê vê mijarê digire dest. Armanca vê raporê ev e ku binpêkirina mafan a têkildarî bikaranîna zimanê dayikê ya di qada tenduristiyê de ku wek encama polîtîkaya yekzimanîyê dertên holê û pirsgirêkên ku ji ber van sedeman derdikevin holê destnîşan bike, vana ji

7 Bikaranîna zimanên kêmaran di heman demê de ji bo xwegihandina qadên cuda yên civakê derfetê dide. Izsák-Ndiaye. age. r. 14.

8 Di vê qadê de statûya Dadgeha Cezayan a Navneteweyî wek awarteyekê ye. Lê divê mirov diyar bike ku Tirkiyeyê piştgirî nedaye vê peymanê.

9 Izsák-Ndiaye, Rita. 2017. *Dîlşel Azînlîkları Dil Hakları, Pratik Uygulama Rehberi*. Cenevre: Birleşmiş Milletler İnsan Hakları Yüksek Komiserliği. r. 19.

10 Ji bo nîqaşêke berfirehtir a li ser têgihê bnr: Fişek, Nusret. «Halk Sağlığında Terim Kargaşası Bir Sorun mudur?» *Türk Tabipleri Birliği Resmi Web Sayfası*. Hat dîtin: 12 01, 2020. https://www.ttb.org.tr/n_fisek/kitap_3/33.html.

aliyê mewzûata neteweyî û hiqûqa navneteweyî ve binirxîne. Armanca xebatê ew e ku karîna hesabdayîna berpirsiyarên bînpêkirinan zêde bike, ji bo civaka sîvîl û rêveberiya giştî pêşniyazên polîtîkayan bike û bi vî awayî piştgiriye bide hewldana lêgerîna mafan a takekesî û kolektîf.

Komên Hedefkirî

Koma hedefkirî ya yekemîn, kesên ku di qada mafên ziman û tenduristiyê de dixebitin, kes û saziyên ku di vê qadê de berpirsiyariyê werdigirin ango çalakger û saziyên civaka sîvîl (SCS) in. Bi vê xebata çavdêrî û nûsafkirinê hatiye xwestin ku agahî û zanînen çalakger û SCSyan ên der barê pirsgerêkên heyî de bînpêkirin. Bidestxistina agahiyan bînpêkanîn, ji aliyê din ve jî pirsgerêkên ku ev aktorên navborî di asta saziyê de dijîn bînpêkirin. Ji ber ku nûsaf dixwaze berpirsiyariya saziyên dewletê di çarçoveya mewzûata neteweyî û navneteweyî de bi bîr bixe, der barê mafê tenduristiyê de bala van saziyan bikişîne, komeke hedefkirî ya xebatê ya din jî di serî de Wezaretê Tenduristiyê, saziyên dewletê yê navendî û xwecihî ne. Komeke hedefkirî ya xebatê ya din jî xebatkarên tenduristiyê ne. Ji bo çareserkirina pirsgerêkê, li gel helwesta dewletê û xebatên SCSyan, şiyarbûna xebatkarên tenduristiyê ya di vê mijarê de xwediyê girîngiyeke bîvênevê ye.

Sînorên Erdnîgariya Xebatê

Weke qada xebatê pêşiyê Diyarbakira ku komeleya me xebatên xwe lê didomîne hatiye destnîşankirin. Li gel vê yekê, di dema xebatên çavdêriyê de hat dîtîn ku ji ber rewşa siyasî û çandî ya Diyarbakirê mirov nikare xwe bigihîne dane-yên cuda yê ku rasterast bînpêkirinên mafên zimanî nîşan didin. Ji ber vê yekê jî, qad hatiye guhertin û xebat bi awayekî ku bajarên wek Mardîn, Van, Hakkârî, Îstanbul, Ankara û Tekîrdagê jî bigire nava xwe hatiye berfirehkirin.

Çarçoveya Hiqûqî ya Mafên Zimanî û Tenduristiyê

Tenduristî di Hiqûqa Navneteweyî de

Li gorî Destûra Bingehîn a Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê¹¹ tenduristî bi tenê rewşa nexweşbûn an jî astengdariyê na, başbûna ji aliyê *fizîkî, derûnî û xweşha-*

11 World Health Organisation. Berhema navborî.

liya civakî ve jî nîşan dide. Li gor destûra bingehîn a rêxistinê ku tenduristiyê wek mafekî bingehîn destnîşan dike, di asta herî bilind a xwegihandina wê de ji aliyê nijad, ol, ramana siyasî, rewşa aborî yan jî civakî ve tu cudakarî nayê kirin. Di Denezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan¹² de tenduristî wek pîvaneke jiyane hatiye pênasekirin û di heman demê de mafên din ên têkildar jî hatine hejmartin û bi wî awayî çarçoveya tenduristiyê hatiye destnîşankirin.¹³

Beşa yekemîn a Xala 12em¹⁴ a Peymana Têkildarî Mafên Aborî, Civakî û Çandî ya Neteweyên Yekbûyî dibêje ku dewletên ku bûne palpiştên Peymanê mafê ku her kes ji pîvanên tenduristiyê yên mental û fîzîkî yên ku her kes di asta herî jor de bikare xwe bigihîne dipejirîne û beşa duyemîn jî ji bo ku mafê tenduristiyê bi her awayî bê bikaranîn bergiriyên ku divê bîn wergirtin vedibêje. Li gor vê Peymanê, dewletên alîgir berpîrsiyar in ku rêjeya bûyînên mirî û mirina zarokan daxê û derfetên bi awayekî tendurist mezinbûna zarok pêk bîne; şert û mercên paqijiyê yên pîşesaziyê û hawirdorî bi hemû awayên baş bike. Dîsa ev dewlet berpîrsiyar in ku pêşiyê li nexweşînan epîdemîk, xwecihî, pîşeyî û yd bigire. Ku mirov nexweş ketibin, wan tedawî bike, ji bo nexweşan derfetên tenduristî û tibî pêşkêş bike.

Ji ber ku tenduristî bi gelek qadên mafên mirovan ên wek qedexebûna îşkenceyê, qedexebûna cudakariyê, mafê mahremiyetê, mafê perwerdehiyê, mafê xwedîbûnê re têkildar e, di gelek peymanan de ku di bin banê Neteweyên Yekbûyî de hatine morkirin behsa van mafan hatiye kirin.¹⁵

Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) mafê tenduristiyê di vê çarçoveya de nixrandiye. *“Mafê jiyane; qedexebûna îşkence, kirinên dermîrovî û biçûkxistinê, azadî û ewlehiya takekes, mafê bi awayekî adilane darizînê, rêzdariya li hemberî jiyana taybet û malbatî, azadiya raman, wijdan û baweriyê, azadiya civîn û damezirandina komeleyan, mafê serlêdana kartêker (têkildarî mafên ku di PMMEyê û protokolên pêvek de hatine sererastkirin) qedexeya cudakariyê, azadiya gera serbest, ewlehiyên usûlî yên ji bo dersînorkirina kesên biyanî û qedexeya cudakariyê ya giştî”*.¹⁶ Ku mirov mîna keke têkildarî mijara me bide, dewlet di çarçoveya mafê jiyane wergirtina bergiriyên têkildarî tenduristiyê de berpîrsiyar e ku ji bo tenduristîya kesên ku di bin desthilatdariya wê de ne hewla pêwîst bide.¹⁷ Bi

12 United Nations. Berhema navborî.

13 Ertan, İzzet Mert. 2012. «Ulusalüstü İnsan Hakları Hukukunda Sağlık Hakkı ve Etkinleştirilmesi.» İ.Ü. Sosyal Bilimler Enstitüsü: Yayınlanmamış Doktora Tezi. r.17.

14 <https://www.ohchr.org/en/professionalinterest/pages/cescr.aspx>

15 Nygren-Krug, Helena. 2007/2002. *Sağlık ve İnsan Hakları Üzerine 25 Soru - 25 Cevap*. Wergêr, Nazmî Zengin. Cenevre: Dünya Sağlık Örgütü/Toplum Sağlığı Araştırma ve Geliştirme Merkezi Derneği. r. 8-9.

16 Karakul, Selman. 2016. «Avrupa İnsan Hakları Mahkemesi Kararlarında Sağlık Hakkı – I.» *İstanbul Medipol Üniversitesi Hukuk Fakültesi Dergisi* 3 (2): 169-206.

17 Tezcan, Durmuş, Mustafa Ruhan Erdem, Oğuz Sancaktar, ve Rifat Murat Önok. 2018. *İnsan Hakları El Kitabı*. Ankara: Seçkin. r. 97-98.

gotineke din, her rewşa ku li pêşiya xwegihandina xizmetên tenduristiyê bibe asteng dê rê li ber bînpêkirina mafê jîyanê veke.

Li dereke ku xizmeta tenduristiyê ya bi zîmanê dayikê ne pêkan be, mirov nikare behsa *pîvanên bilind ên xwegihandinê* bike. Ev rewş wek ku sûdwergirtina ji xizmetên tenduristiyê ya kesan asteng dike, dibe sedema sepanên cudakar ên dewletê jî. Li dereke ku dewlet li hemberî nasnameyêke etnîk cudakariyê bike, mirov nikare behsa bergiriyên pêkanîna mafê tenduristiyê bike. Dewlet bi pêkneanîna berpirsiyariyên xwe yê pozîtîf û qedexekirina zîmanê dayikê li dijî hiqûqa navneteweyî tevdigere û dike ku di heman demê de xespirîna mafê tenduristiyê û polîtîkayên cudakar ên di xizmetên tenduristiyê de ji aliyê civakê ve bînjirandin.

Saziya Tenduristiyê ya li Tirkîyeyê

Veguhastina hiqûqa navneteweyî ya ji bo hiqûqa navxweyî ya Tirkîyeyê, tevî ku di xala 90/5em a Destûra Bingehîn a 1982yan (Ji niha şûnde wek Destûra Bingehîn) de bi awayekî zelal hatiye vegotin jî Tirkîye Destûra Bingehîn a xwe wek norma pîvan, tiştên ku di bin banê NYyê de hatine kirin an jî peymanên mafên mirovan ên navneteweyî yê wek PMMEyê¹⁸ yê ku herî zêde behs dike jî wek norma alîkar/palpişt dibîne û vê helwesta xwe didomîne. Li gor Xala 11em a Destûra Bingehîn, Destûra Bingehîn li Tirkîyeyê norma bingehîn ew e ku hemû zagon, sazî û kesan girêdide. Ji ber vê yekê jî, tevî ku ji bo mafên mirovan peymanên navneteweyî zêdetir girîngin jî, ji ber bandora wê ya li ser sepanan divê mirov li beşên destûra bingehîn ên têkildarî tenduristiyê binihêre.

Di Xala 56em a Destûra Bingehîn de mafê tenduristiyê hatiye destnîşankirin.¹⁹ Dema ku mirov li Xalê û sedema wê²⁰ dinihêre, mirov dibîne ku Destûra Bingehîn tenduristiya takekes û hawirdorê bi hev re nirxandiye, tenduristî wek tenduristbûna laş û derûniyê pênase kiriye, ji bo hawirdoreke tendurist jî perwerdehî pêwîst dîtiye²¹ û gotiye divê dewlet bi sîgortaya tenduristiyê ya giştî bike ku derdorên xizan ji xizmetên tenduristiyê di asteke pêwîst de sûdê wergirin. Dîsa li gor biryara Dadgeha Destûra Bingehîn “xizmetên tenduristiyê rasterast têkildarî mafê jîyanê ne”.²²

18 Peymana Der Barê Parastina Mafên Mirovan û Azadiyên Bingehîn a 4ê sermaweza 1950yê. https://www.echr.coe.int/documents/convention_eng.pdf

19 Dîsa xalên 2yem û 17em.

20 Akad, Mehmet, ve Abdullah Dîncol. 2007. *1982 Anayasası ve Anayasa Mahkemesi Kararları*. İstanbul: Der. r.388-389.

21 Berhema navborî. 389.

22 E: 2010/29, K:2010/90, Roj: 16.07.2010, R.G. Mêjû-Hejmar: 04.12.2010-27775.

Yek ji sererastkirinên girîng a din a di xalê de jî di bin banê Wezareta Tenduristiyê de yekdestîkirina kar û barên tenduristiyê ye. Ji ber vê yekê, mirov bi hêsanî dikare bibêje li gel ku sendîka û odeyên ku xebatkarên tenduristiyê endamên wan in hene jî, polîtîkayên tenduristiyê di bin yekdestiya wezaretê de, li gor pergala nû di bin yekdestiya serokomariyê de ne.

Têkoşînên Alternatîf ên li Dijî Polîtîkayên Tenduristiyê yên Tirkîyeyê

Têgiha tenduristiyê di Destûra Bingehîn de li gor pênaseya di hiqûqa navneteweyî de hatiye pênasekirin. Tevî ku aliyekî wê yê neyînî heye jî, tenduristî mafek e ku bi awayekî giştî di bin berpirsiyariya erênî ya dewletê de ye. Bi gotineke din, berpirsiyariya dewletê ya pozîtîf ew e ku bergiriyê li xerabûna tenduristiyê bike, tenduristiya xerabûyî sererast/tedawî bike. Di pratîkê de jî ev yek li gel binasaziya tenduristiyê bi awayê herî baş perwerdekirina xebatkarên tenduristiyê û xebata wan a bi rêk û pêk ve girêdayî ye. Di perwerdehiyê de ku ziman bi awayekî kartêker bê/bên bikaranîn dikare asteke bilind bê bidestxistin. Lê wek ku di rapora me ya berê de jî hatibû diyarkirin,²³ Dewleta Tirkîyeyê di serî de Kurdî, destûrê nade perwerdehiya bi gelek zimanên kêmaran. Ji ber vê yekê jî di navbera xebatkarên tenduristiyê û wan hemwelatîyan de ku bi Tirkî qet nizanin an jî nikarin bi awayekî baş bi kar binin pirsgirêka têgihîştinê derdikeve holê. Ev yek jî dike ku ji xizmetên tenduristiyê bi awayekî baş sûd neyê wergirtin û di hinek rewşan de bûyerên ku digihîjin heta asta bînpêkirina mafên jiyanê jî derkevin holê.

Tevî ku di Plana Stratejîk a 2019 - 2023yan (Di Tirkîya wê de dibêje 2019-2013 a Wezareta Tenduristiyê de ya ku bi diruşma “*tevahiya dewletê, tevahiya civakê*” hatiye amadekirin, behsa gelek pirsgirêkên ku kesên bi wan re hevpeyvîn hatine kirin jî li jêrê vegotine, hatiye kirin, ziman û çand wek “astengên herî mezin ên li ber xizmetên tenduristiyê” hatiye pênasekirin jî, di plana navborî de mirov der barê xizmetên tenduristiyê yên bi zimanê dayikê de tu sererastkirinan nabîne.²⁴ Di raporê²⁵ de hatiye gotin ji bo ku koçber xizmeteke tenduristiyê ya kartêker wergirin, divê li Navenda Tenduristiya Koçberan xebatkarên ku bi zimanên biyanî dizanin bîn bicihkirin. Lê der barê zimanê dayikê de tu plan an jî armanc tune ne. Ji ber vê yekê, rewşeke ku haya dewletê ji pirsgirêkê heye lê wek tercîheke polîtîk çareseriyê pêk nayne, heye. Bi gotineke din, piraniya kêmarên zimanî û olî di rewşekê de ne ku dewlet bi têtîkîliya hemwelatîbûnê wan bi xwe ve girêdide lê bi sepanên cuda

23 Dede, Savaş. 2020. *Çocuk ve Dil Hakları Raporu*. Diyarbakır : Önce Çocuklar Derneği.

24 T.C. Sağlık Bakanlığı. Berhema navborî. r. 53, 110, 113, 132.

25 Berhema navborî: r.176.

wan veder dike. Li dereke ku dewlet bi awayekî bîrdozî nêzî xizmetên tenduristiyê bibe jî, ji ber ku zimanê dayikê rasterast an jî bi awayekî ne rasterast qedexe ye, barê têkoşîna li dijî pirsgrêkan wek gelek qadan dîsa li ser milê saziyên civaka sivîl û însiyatîfên takekesî dimîne.

Xebatên têkildarî xizmeta tenduristiyê ya bi zimanê dayikê mixabin bi pîranî bi xebatên SCS, partî û çalakgerên li bajarên Kurdan sînorkirî mane. Ji vî aliyê ve yek ji xebatên herî girîng ên ku mirov dikare behsa wan bike Kongreya Tibê ye ya Mezopotamyayê ya ku bi Kurdî hatiye kirin. Kongreya pêşîn di navbera 22 û 24ê kewçêra 2009an de li Amedê û ya heftemîn jî li Wanê di sala 2015an de hatiye lidarxistin. Di encama wan êrîşan de ku di heman serdemê de li pey hev hatin şerê li bajarên Kurdan dîsa hat gurkirin û di encama wê de bi hezaran çalakvan û siyasetmedarên Kurd hatin girtin, ji saziyên ku lê dixebitîn hatin îxrackirin, ji ber rewşa pêkutiyên a ku didomiya kongreya 8emîn li bajarê Duhokê ya Herêma Kurdistanê Iraqê hatiye lidarxistin.

Xebateke din a bi mijara tenduristî û zimanê dayikê, Komxebata Tenduristiyê ya Kongreya Civaka Demokratîk a ku di bin banê Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) de hat lidarxistin e. Lê ji ber ku ev demek e gelek endamên wê û endamên lijneya rêvebir di çarçoveya lêpîrsînên “terorê” de hatine binçavkirin û girtin û tê xwestin ku KCD bê terorîzekirin, xebatên di vê qadê de nehatine domandin.²⁶

Divê mirov bi kinasî behsa weşanên têkildarî qada tenduristî û ziman bike. Anamneza bi kurmançî ango “çîroka nexweş” berhema tekane ya bi Kurdî ya têkildarî pêvajoya herî girîng a xwegihandina xizmetên tenduristiyê ye.²⁷ Pirtûkeke din jî Anatomiya Bedena Mirovan a ku ji aliyê Huseyîn Bektaş ve hatiye nivîsandin û dîsa di qada xwe de ya pêşîn e.²⁸ Pirtûka sêyemîn a ku divê behsa wê bê kirin jî Alîkariya Destpêkê ya ku ji aliyê Erdal Sîpan ve hatiye amadekirin û alîkariya destpêkê bi wênayan vedibêje.²⁹ Di nava weşanên demkî de jî yekemîn kovara derûnnasiyê ya bi Kurdî, Psychology Kurdî heye.

Rêbaz

Di xebatê de du teknîkên berhevkirina daneyan hatine bikaranîn. (1) Civîna koma fokûskirî û (2) Hevîdinên bi hûrgilî yên ku nivîdiyarkirî: Di vê çarçoveyê de pê-

26 Wek mînakê herî rojane: Türk Tabipleri Birliği. 2020. «Dr. Şeymus Gökalg tutuklandı: İyi hekimlik değerlerini savunmak suç değildir!» TTB Resmi Web Sayfası. 04.11. Hat dîtîn: 11.25.2020. https://www.ttb.org.tr/haber_goster.php?Guid=f9c91b3a-2e1c-11eb-ae8b-076e13122378.

27 Bülül, İsrâfil, ve Mikail Bülül. 2009. *Kürtçe Anamnez-Anamneza bi Kurmançî*. Düzenleyen: Adem Avcıkıran. Diyarbakır: Diyarbakır Tabip Odası.

28 Bektaş, Hüseyin. 2004. *Anatomiya Bedena Mirovan*. İstanbul: Deng.

29 Sîpan, Erdal. 2019. *Alîkariya Destpêkê*. Wan: Sîtav.

şiyê civîneke li ser înternetê ya ku 2 saetan domiya bi koma fokûskirî re hat lidarxistin. 5 xebatkarên tenduristiyê, beşdarî vê civînê bûn. Ji ber ku di civîna koma fokûskirî de daneyên qadî hindik hatin bidestxistin, hevpeyvînên yek bi yek hatin kirin. Beriya xebatê li gor ehlaqê lêkolîna zanistî mijarên ehlaqî hatin diyarkirin û bi beşdaran re hatin parvekirin. Weke pêdiviya mijarên etîk ên ku hatibûn diyarkirin, bi awayekî veşarî em li gor pîvanên veşarîbûnê tevgeriyên. Daneyên ku agahiyên takekesî yên beşdaran bi awayekî rasterast an jî ne rasterast diyar bike nehatine dayîn û agahî bi kesên sêyemîn re nehatine parvekirin.

Di vê çarçoveyê de beşdarên civîna koma fokûskirî jî tê de, bi giştî bi 22 kesan re hevdiîtin hatine pêkanîn. Ji vana 3 jin, 19 jî mêr bûn. Dîsa ji vana 12 jê bijîşk, 3 teknîkerên tenduristiyê, 2 dermansaz û 2 jî derûnînas bûn. Dîsa bi biyologeke, xebatkareke rêveberiyê û pisporeke xizmetên civakî re hevdiîtin hatiye pêkanîn.

Hewl hat dayîn ku li gor kategoriyên xebatkarên ên berfireh ên di qada tenduristiyê de bi xebatkarên tenduristiyê yên di peywirên cuda de hevpeyvînên bê kirin. Lê pêkan nebû ku em xwe bigihînin hemû qadên pisporî û pîşeyî. Li gel vê yekê jî, ji ber ku piraniya kesên ku hevdiîtin bi wan re hatibûn kirin endameke/e çalak a SCSyê bûn û hinek ji wan jî pîşeyên cuda yên wek derûnînasî, pisporiya xizmetên civakî, biyolog û teknîker bûn. Vê yekê kir ku li gel tesbîtên hevpar ên der barê ziman û tenduristiyê de, aliyên pir cuda jî bêne destnîşankirin.

Pirsgirêka herî girîng a têkildarî pêvajoya berhevkirina daneyan wek ku di rapora me ya Zarok û Mafên Zimanî de hatibû diyarkirin, polîtîze yan jî tero-rîzekirina zimanê dayikê ye. Ji ber vê yekê, bi taybetî di dîtina beşdaran de zehmetî hat kişandin. Weke mînak; çar kes bi gumana ku dê *polîtîk* be, beşdarî xebatê nebûn.

Di pêvajoya xebatê de rewşa zayendî li ber çavan hat girtin. Hejmara beşdaran gihîşt asta ku dihat xwestin, hewl hat dayîn ku hejmara beşdarên jin bê zêdekirin lê ji kesên ku me xwe gihand wan, di vê mijarê de tu bersiv nehat wergirtin.

Pirsgirêkên der barê Mafên Ziman û Tenduristiyê de

Di civîna koma fokûskirî û hevpeyvînan de wek mijarên bingeîn zimanê dayikê û tenduristî, pirsgirêkên ku ji ber xizmeta tenduristiyê ya yekzimanî derdikevin holê, bînpêkirinên mafên mirovan ên ku der barê ziman de di qada tenduristiyê de derdikevin holê, pêşniyazên reformên siyasî yên çareserkirina pirsgirêkên der barê mijarê de û mijarên der barê berpirsiyariyên SCS de hatine gengeşekirin. Agahiyên ku di encama nîqaşan de hatine bidestxistin, li gor hiqûqa mafên mirovan li jêrê hatine senifandin.

*Xwegihandina mafê tenduristiyê û anamnez:*³⁰ Rêzicknameya Tenduristiyê ya Navneteweyî³¹ anamnezê di muayeneya tibî de wek *nirxandina ku der barê kesê/a ku di bin çavdêrî û venêrîna rasterast a peywîrêdarê/a tenduristiyê yan jî meqamekî rayedar de tê kirin* pênase dike. Tevahiya beşdarî dibêjin ku bi ziman neyê zanîn, wergêr hebe jî dê bi nexweş re têkiliyêke rast neyê danîn. Bijîşkan gotin ku heta mafê zimanê neyên pejirandin û di navbera xebatkarên tenduristiyê û nexweş de ragihandineke baş pêk neyê, ne pêkan e ku anamnez bi awayekî hûrgilî û berfireh bê wergirtin. Yê ku di beşên nexweşên giran û beşa lezgin de dixebitin jî gotin ku ji bo ku di demeke kin de destwerdaneke kartêker bê kirin, divê bi zimanê dayikê têkilî bê danîn. Lê ku mafên zimanê neyên pejirandin, ne bi tenê di pêvajoya anamnezê de, di tevahiya pêvajoyên pênasekirin, tedawî û şopandinê de jî dê pirsgerêka têgihîştinê çêbibe. Di pergala tenduristiyê ya Tirkîyeyê de ya ku dem pir hindik e û hejmara nexweşên ku bijîşkek rojane lê dinihêre pir zêde ye, pir zehmet e ku xebatkarên tenduristiyê rêbaza *primumnonnocere*³² baş pêk bînin. Heta li gor gotina bijîşkekî daxuyaniyên nexweş dibin sedem ku teşxîsa nexweşiya nexweş di rewşa “konfûze”³³ de bê kirin.

Tenduristî, mafê jiyane û pîvana jiyane: Hemû beşdar hev fikir in ku tenduristî rasterast an jî bi awayekî ne rasterast têkildarî mafê jiyane ye û ziman “jiyane rizgar dike”.³⁴ Lê xizmeta tenduristiyê ya bi zimanê dayikê bi tenê mafê jiyane naporêze, di heman demê de pîvana jiyane jî bilind dike. Xizmeta tenduristiyê ya bi zimanê dayikê di asteke girîng de bandorê li çawaniya têkiliya xebatkar û nexweş dike û di heman demê de bandorê li pêşketina ziman jî dike. Di vê mijarê de pirsgerêka herî girîng jî bipêşneketina termînolojiya tenduristiyê, bi demê re jibîrkirina têgih û termên heyî, bi gotina beşdarekî “*pêvajoya têkildarî tenduristiyê bixwe jî vediguhere zincîreyeke binpêkirinan*”.

Tengbûna qada taybet û biyanîbûna ji qada giştî re: Xwegihandina xizmetên tenduristiyê di heman demê de dike ku derdorên kêmdarfet ên ku di qadeke taybet de tengav bûne jî bikarin beşdarî qada giştî bibin. Hatiye dîtin ku ji ber ku di hişê wî/wê kesî/ê de ku di qada taybet de asteng bûye der barê qada giştî de têgihîştina *saziya dewletê* pêk tê, jin an jî kal û pîrên ku bi ziman nizanin bi alîkariya kesên sêyemîn diçin dermanxaneyan jî. Dîsa jî beşdarî

30 Anamnez : Hînbûna çîroka nexweşiya nexweş.

31 World Health Organisation. 2005. *International Health Regulations*. Geneva: WHO Press. S. 8.

32 “Berî her tiştî zirarê nedin!”

33 Konfûzyon: Rewşa ku hiş zelal nîn e, di famkirin û danfamkirinê de pirsgerêk hebe.

34 Izsák-Ndiaye. Berhema navborî. r. 14.

yekî got ku ji ber yê ku bi Tirkî nizanin şerm dikin, naxwazin ku pêvajoyên piştî teşxîs û tedawiyê bişopînin. Pisporekî onkolojiyê jî got ku nexweşên ku bi ziman nizanin bi piranî encax di pêvajoyên pêşketî yê pençeşêrê de serî li wan didin. Rewşeke ku dişibe vê rewşa ku hinek beşdaran aniye ziman ji aliyê Izsák-Ndiayetarafından ve hatiye destnîşankirin:³⁵ *“Hewldanên cuda nîşan didin ku bikaranîna zimanên kêmaran di xwegihandina bi jinan de, zêdekirina beşdariya jinan de û di xurtbûna wan de pir girîng e.”*

*Pirsgirêka “kesê sêyemîn”*³⁶: Bi taybetî li nexweşxaneyan ji bo yê ku ji ber ku bi ziman nizanin nikarin xwederbirînin, hewl tê dayîn ku “piştgiriya wergêriyê”³⁷ bê dayîn. An jî bi alîkariya wergerê ya lêziman nexweşan pêvajoya pênasekirin û tedawiyê tê meşandin. Lê ev rewş li gel pirsgirêka wernegirtina çîroka nexweşîna kes (anamnez), ji ber ku nexweş û bi taybetî jî jin li bal kesê/a sêyemîn bi awayekî hêsan xwe naderbirînin, ev pêvajoyê bi cudakariyeke li ser bingeha zayendê vediguhere cudakariyeke komî. Bi gotineke din, takekes hem ji ber ku bi Tirkî nizane û hem jî ji ber zayenda xwe du carî cudakariyê dibe. Ji beşdaran hinekan, bi taybetî dermansazan gotin ku bi ser van neyîniyan hemûyan de ev rewş dike ku komên kêmdarfet berê xwe bidin tîba alternatîf.

Yên ku di jiyana rojane ya “asaî” de rastî cudakariyê tîna an jî di rewşeke kêmdarfetiyê de ne dema ku qeyranên kurewî û civakî yê wek pandemiyê tîna rojevê, yê ku herî pêşiyê dev ji wan tîna berdan in. Gotinên bijîşkekî yê der barê vê rewşê de pirsgirêkê zelaltir dike: *“Ya rast, em, dûrahiya civakî na, dûrahiya fîzîkî pêşniyaz dikin. Di pêvajoyên bi vî rengî de bi awayekî dijber, divê dûrahiya civakî ji holê bê rakirin û pêdivî zêdetir bi tîkiliyên civakî heye de ji bo ku ev yek bê kirin zêdetir pêdivî bi atmosfereke azadiyê û teknolojiyeke pêşketîtir heye. Lê mixabin ji ber qedexekirina ziman, di rewşekê de ku em nikarin rû bi rû bi hêsanî nikarin tîkiliyê daynin bi rêya navgînên wek telemedîcine”*³⁸ hema bibêje ne pêkan e.”

Ziman û jiyana rojane: Jiyan rojane ji nîşandana tevgerên ku zêdetir wek *tîştên jixwe heyî* (taken for granted) pêk tê.³⁹ Ev tevger jî di encama pêvajoyê

35 Izsák-Ndiaye. Berhema navborî. r. 12.

36 Li gor Georg Simmel *kesê/a sêyemîn* ew e ku tîkiliya di navbera du kesan de dişikêne, dikeve navbera wan û dike ku ew tîkîlî ji aliyê raya giştî ve bê hînkirin. Bi vî awayî jî kesê/a sêyemîn dibe sedem ku cureyê tîkiliyê ya ji derveyî ya *merhem* derkeve holê. Simmel, Georg. 2009. *Sociology Inquiries into the Construction of Social Forms*. Almandadan çeviren Anthony J. Blasi, Anton K. Jacobs ve Mathew Kanjirathinkal. Boston: Brill.

37 Li vê derê tîştê ku tê qestkirin divê ji kesekî/e ku zimanê wî/ê yê dayikê di heman demê de yê nexweş be jî, heger pêkan be, alîkarî were girtin. Di qada tenduristiyê de, ji bo kesên ku zimanê wan ê dayikê kurdî ye piştgiriya wergêriyê nayê dayîn.

38 Telemedicine: Cureya xizmeta tenduristiyê ya ku bi rêya teknolojiyê dike ku di navbera cihên ji hev dûr de jî karên wek teşxîs, tedawî û tîba bergir bên kirin.

39 Garfinkel, Harold. 1967. *Studies in Ethnomethodology*. New Jersey: Prentice-Hall.

yeke formasyona çandî de tèn hînkirin. Takekes di piraniya jiyana xwe ya rojane de şarezatiya têkiliyê ya ku bi vê rêyê bi dest xistiye bi kar tîne. Saziyan ku bi zimanê dayikê xizmet lê nayê dayîn di wan hemûyan de ji ber ku herikîna rojane xera dibe, pirsgirêka xwederbirandina kesên dertê holê. Li gor beşdarên takekes dema ku hewl dide bi zimanekî ku ji aliyê çandî ve jî biyanîyê wî ye xwe derbirîne pirsgirêka “asêbûna di nava du zimanan de” dijî. Lewra nexweş dema ku pirsgirêkeke tenduristiyê dijîn bi Kurdî jî baş nizanin ku dê çawa derdê xwe bibêjin. Kategoriyên ku vê pirsgirêkê zêdetir dijîn dîsa kal û pîr û jin in. Bi taybetî jî kal û pîr ji ber ku nifşên ciwan ji zimanê dayikê dûr ketine û zêdetir bûne biyanîyên kodên çandî, pirsgirêka ragihandinê dijîn.

Perwerdehiya tibê ya yekzimanî: Weke ku di hemû nûsafên me yê tema-tîk de hatiye diyarkirin, yekzimanîbûna perwerdehiyê bi awayekî neyînî bandorê li tevahiya jiyana dike. Perwerdehiya yekzimanî bi qasî ku çawaniya perwerdehiyê kêr dixê, bi heman awayî dibe sedem ku encamên perwerdehiyê yê fizîkî jî yekzimanî bin. Ji ber vê yekê jî xwegihandina hemû materyalên têkildarî tenduristiyê û bi awayekî kartêker bikaranîna wan jî dijiwartir dibe. Weke mînak; ji beşdarên yekî got ku ne bi tenê zimanê axaftinê, hemû awayên sembolîk ên têkildarî tenduristiyê (wek mînak; tabela) derfeta xwegihandina xizmetên tenduristiyê zêde dikin û newekheviyan kêr dikin. Dîsa mijareke din a ku gelek caran hat gotin jî ew bû ku di qada xebatên akademîk jî -yek ji qadên ku rêjeya xebatên bi Kurdî di asta herî “îdeal” de ye yek e⁴⁰ di bin bandora Tirkî û zimanên din ên gerdûnî yê serdest de ye.

Di têkiliyên berwarkî û tîkane de hiyerarşî: Nexweşê/a ku bi ziman nizane li hemberî hiyerarşiya bijîşk⁴¹ ê ku têkiliya otorîteya tîkane dinimîne û ji ber ku xizmeta giştî pêşkêş dike, di heman demê de nûnertiya otorîteya giştî jî dike, dikeve rewşeke dijawantajtir. Lê ji ber ku zimanên kêrmarîyan tê bêrûmetkirin, prestîja wî tê daxistin. Kesên ku xizmetên tenduristiyê dixwazin jî xebatkarên tenduristiyê yê ku bi zimanê wî/ê diaxivin jî wek kesên zêde ne pispor dibîne. Weke ku ji serpehatiyên beşdarên jî hat famkirin, polîtîkayên têkildarî zimanên kêrmarîyan bi kartêkirineke derûnî di navbera wan kesên de ku heman pîşeyê dikin jî hiyerarşiyekê diafirîne. Lê divê bê gotin ku piraniya beşdarên dan diyarkirin ku ev têgihîştina derûnî ya têkildarî Kurdî hêdî hêdî ber bi şikestinê ve diçe.

40 Fidan, Omer. 2020. *Wek Hêmeya Bingehîn a Çandê Zimanê Dayikê û Bikaranîna Wî*. Amed : Komelaya Berî Her Tiştî Zarok. [Fidan, Omer. Kûltûr û Temel Ögesi Olarak Anadili ve Onun Kullanımı. Diyarbakir: Önce Çocuklar Derneği]

41 Ertan, berhema navborî. r.107.

Vederkirina ji aliyê xebatkarên ve: Hinek beşdarên gotin ku xebatkarên ku bi zimanê nexweş nizanin carinan paxavê bi nexweşên ku bi Tirkî nizanin nakin, hinekan jî gotin ku hem ji ber ziman û hem jî ji ber sedemên “xuyakirina wek Kurdekî/ê” yê wek bikaranîna kefiyê/pûşiyê⁴² nexweş gelek caran rastî cudakariya neyînî tên. Lê ev rewş bi piranî li gor serpehatiyên xwe yê li cihên derveyî bajarên Kurdistanê ziman.

Pirsgirêkên Aktorên Civaka Sîvîl

Di beşa berê de li gor encamên hevdiştinan, li ser mijarên wek tenduristî û mafên jiyandê, di serî de tenduristî di beşdarbûna jiyana giştî û wergirtina xizmeta giştî de girîngiya ziman, ji ber pergala yekzimanî ya ku di qada tenduristiyê de tê sepandin, bi taybetî li hemberî kom û nasnameyên kêmdarfet cudakariyekê pêk tîne, hatibûn nirxandin. Di vê beşê de jî pirsgirêkên ku sazî û kesayetên ji bo çareserkirina pirsgirêkên mijara gotinê kedê didin, hatine vegotin. Di nava pirsgirêkan de ya ku herî zêde derdikeve pêş jî helwesta dewletê ye, ya li hemberî xebatên ku di qada ziman de tên kirin.

Polîtîzasyon, krîmînalîzasyon, marjînalîzasyon: Ev astengkirinên ku di Rapora Zarok û Mafên Zimanê⁴³ de bi awayekî hûrgilî hatine vegotin ji aliyê hemû beşdarên ve hat ziman ku bi heman awayî di qada tenduristiyê de jî derbasdar in. Pêkutî li qada xebatê yan jî li kargêhê vediguherin mobîngê, li gor hinek beşdarên jî “pêdayîna erdê ya ji bo zimanê dayikê” dibe sedema lêpîrsînên îdarî û adlî.

Şiyana domdariyê: Ji ber ku daxwaz û xebat bi domdarî tên terozekirin, ev yek jî dike ku derfeta meşandina xebatê nemîne, di xebatan de koordînasyon kêmbibe yan jî şiyana domandina van xebatan têk biçe. Encameke neyînî ya vê rewşê ya din jî ew e ku çandeke şiyana domdariyê pêk nehatiye. Dîsa ji ber bandora neyînî ya pêkutiyên polîtîk a li ser koordînasyon û şiyana domdariyê, di qada têkildar de bîrek pêk nayê û bi vî awayî wendahiyeke civakî ya mezin derdikeve holê.

Barê kar: Ji hevpeyvanan hat diştin ku berpirsiyariyên dewletê yê erênî û neyînî yê ku çavkaniya wan mafên mirovan e veguherîne “destwerdana erênî û neyînî”⁴⁴. Ji ber ku dewlet berpirsiyariyên xwe yê têkildarî mafên tenduristiyê yê bi zimanê dayikê bi cih nayne, barê SCS û însiyatîfên takekesî girantir dibe. Lê di vê xalê de jî

42 Parçeyekî cil û bergan ê ku mêr didin serê xwe, bi taybetî jî ji ber ku çalakvanên Kurd û Filîstîni di dema çalakîyan de li serê xwe dipêçin, wateyeke polîtîk lê hatiye barkirin.

43 Dede, berhema navborî.

44 Berhema navborî.

rewşeke ku dewlet xebatan asteng dike dertê holê. Weke encam; SCS û çalakger neçar dibin ku hem di qada tenduristiyê de û hem jî di qada siyasî de hem têbikoşin û hem jî di heman demê de kêmasiyan temam bikin.

Pirsgirêkên aborî û bandora pandemiye ya ku zêdetir dibe: Di demekê de ku xebatên mafan ên li bajarên Kurdistan ji ber pêkutiyên siyasî û biryar-fermanan (KHK) hema bibêje hatibûn asta sekinînê, aktorên civaka sîvîl xwe dan hev û ji nû ve dest bi xebatan kirin. Lê vê carê jî bandorên neyînî yên pandemiya Covid - 19ê xebat diwartir kir. SCS û çalakgerên ku di nava pirsgirêkên aborî de digewizîn bi pandemiye re dijawariya koordînasyonê jî jiyane û bi heman awayî neçar mane ku ji koma xwe ya hedefkirî dûr bikevin.

Pêşniyazên Çareseriyê yên ji bo Mafên Ziman û Tenduristiyê

Binpêkirinên mafên mirovan ên ku di qada ziman û tenduristiyê de tîn jiyîn û dijawariyên kesên ku têkoşîna çareserkirina van binpêkirinan dimeşînin dijîn di beşên berê de hatibûn vegotin. Di vê beşê de jî astengkirina binpêkirinan, pêşniyazên reformên siyasî yên têkildarî çareserkirina pirsgirêkan û pêşniyazên têkildarî aktorên civaka sîvîl hatine vegotin.

Pêşniyazên ji bo reformên siyasî

Statû: Tevahiya beşdarên diyar kirin ku di çarçoveya veguherînên bingehîn de divê zimanên ji derveyî Tirkî bîn pejirandin û ji bo ku ev ziman di xizmetên giştî de bîn bikaranîn divê xwediyê statûyeke hiqûqî bin. Heta ku statûyeke zimanê dayikê tune be, dê pirsgirêk bi awayekî mayînde çareser nebe. Dîsa heta ku statûyeke ziman tune be, ne pêkan e ku mirov bigihîje pîvanên jiyanê yên ku mafên tenduristiyê jî digire nava xwe.⁴⁵

Perwerdehiya tibê ya bingehîn a bi zimanê dayikê: Li gor beşdarên zanîna xwendin û nivîsandina tenduristiyê ya pirzimanî û perwerdehiya tibê dê bike ku gelek pirsgirêkên di qada tenduristiyê de bîn çareserkirin û asta xizmetên tenduristiyê baştir bibe.

Encamên aborî yên ziman: Zimanên ku ji bo wan tazmînata ziman didin karmendên dewletê di nav wan de mixabin piraniya zimanên kêmarên li Tirkiyeyê tune ne. Beşdarên gotin ku di pêvajoya pêkanîna pişeyê de zanîna bi

45 Ji bo encamake bi heman rengî bnr: Rawest Araştırma. 2020. «Ebeveyn ve Çocuk Arasında Anadilin Durumu.» Rawest Araştırma. Hat dîtîn: 2020 12. https://rawest.com.tr/wp-content/uploads/2020/02/Ebeveyn_Ana_Dil_Arastirmasi.pdf.

gelek zimanên cîhanê yên ku tu sûdeweriya wan tune ye bi tazmînata ziman tîn xelatkirin lê tu sûdeke zanîna zimanên komên etnîk ên li Tirkiyeyê ji bo vê yekê tune ye û ev yek di heman demê de cudakariyeke neyînî ye. Dîsa gotin ku encamên aborî dê bikin ku prestîja ziman zêde bibe û pêvajoyên derûnî yên têkildarî ziman berovajî bibin û bandoreke erênî bibe.

Materyalên tenduristiyê yên pîrzimanî: Di pêşkêşkirina xizmetên tenduristiyê de bi tenê têkiliya di navbera nexweş û xebatkarên tenduristiyê de na, hemû alav û amûrên pêşkêşkirina xizmetan xwediyê erkeke ragihandinê ne. Ji ber vê yekê hemû materyalên ku di qada tenduristiyê de tîn bikaranîn divê bi awayekî pîrzimanî û duzimanî bîn amadekirin.

Perwerdehiya xebatkarên a di mijarên ziman û çandê de: Pergala sembolîk a ku jê re ziman tîn gotin di çarçoveyeke çandî ya diyar de, bi awayekî temam dibe xwedî wate. Ji ber vê yekê, divê xebatkarên li hinek herêmên diyar ji aliyê ziman û çanda herêmê ve bê perwerdekirin.

Weke mafekî xwezayî yê ku nayê nîqaşkirin pejirandina mafê zimanî: Heta ku mafê zimanî weke mafekî xwezayî neyê dîtin, dê her tim wek mijareke bazariya polîtîk bê bikaranîn. Ji ber vê yekê jî, sererastkirinên têkildarî ziman li şûna ku bi rengekî sembolîk an jî pêdiviyên protokolê bin, divê encamên wê yên şênber û pratîk hebin. Ji bo vê yekê jî divê bê pejirandin ku mafê ziman mafekî xwezayî ye û li gorî vê nêzikatî pêk bîn.

Pêşniyazên ji bo aktorên civaka sîvîl

Koordînasyon û hevkarî: Li gor beşdarên, ji ber ku di mijara Kurdî de otorîteke xwecihî yan jî neteweyî tune ye, koordînekirina xebatên ziman dikeve rewşeke nepêkaniyê. Beriya her tiştî, divê têkilî û koordînasyona di navbera wan SCSyan de ku di qada tenduristî û mafên zimanî de dixebitin bê xurtkirin. Kêmasiyên têkildarî xebata kolektîf û rêxistinbûnê ji holê bîn rakirin û di termînolojiya tibê de standardîzasyonêk bê pêkanîn. Ne bi tenê yê takekesan, divê zimanê saziyan û “hiqûqî”yan jî Kurdî be û ziman rengekî civakî wergire.

Zêdekirina çavkaniyan û bikaranîna teknolojiyê: Beşdarên ji kêmbûna xebatên ku di qadê de hatine kirin gilî û gazin kirin. Hinek xebatên kolektîf ên ku ji derveyî însiyatîfên takekesî tîn kirin jî hem ji ber pêkutiyên polîtîk, hem jî ji ber pirsgerêka koordînasyonê nivco dimînin. Ji bo çareserkirina pirsgerêka di qadê de hem divê bikaranîna medya û teknolojiyê bê zêdekirin û hem jî pisporbûn pêk bê. Ji bo vê yekê jî wek hewleke sîvîl, divê Akademiya Tibê ya bi Kurdî bê damezirandin. Ev pêdiviyêke bivênevê ye. Li aliyê din jî, divê çalaki-

yên weke kongre û konferansên têkildarî qadê bîn zêdekirin.

Mafê zimanî divê şertê bingehîn be: Li gor hinek beşdaran qadeke wek ziman a ku ji bo jiyana civakî xwediyê girîngiyeke bivênevê ye divê di teva-hiya têkoşîna polîtîk de wek xeta sor bê pejirandin. Heta ku pirsgirêka ziman neyê çareserkirin, têgihîştina der barê ziman de neguhere, mirov nikare di qada polîtîk de behsa mafan bike. Li gor hinekan jî, li gel ku ev nêrîn rast e jî, bêtir ku li benda dewletê bê sekinîn, divê civaka sîvîl di qada ziman de bergiriyên lezgîn wergire û bernameyan bi pêş bixe. Gava pêşîn a ku divê di vê mijarê de bê avêtin hem perwerdehiya ziman a bingehîn û hem jî ya taybet e.

Encam

Li Tirkiyeyê mafê zimanî yê kêmaran wek hemû qadên jiyane yê din di qada tenduristiyê de jî dike ku pirsgerêkên jiyani û cudakarî kûrtir bibe. Bi taybetî jî ku mijara gotinê zimanê Kurdî be, dewlet daxwazên maf tepeser dike, diçewisîne û terorîze dike. Tiştê ku dike mijar bibe pirsgerêkeke polîtîk jî, cudakariya ku dewlet li hemberî kêmarên ku wek hemwelatî destnîşan dike pêk tîne ye.

Daneyên ku di encama pêvajoya lêkolînê de hatine bidestxistin ku li gor pîvanên ku di hiqûqa navneteweyî de hatine diyarkirin bîr nixandin, bi awayekî zelal tê dîtin ku Tirkiye mafê zimanî binpê dike. Dema ku çarçoveya mafê tenduristiyê li ber çavan bê girtin, bi wê ve girêdayî rêzek binpêkirinên din jî dertên holê. Her çî qas mînaka vê yekê ya herî şênber binpêkirina mafê jiyane be jî, gelek binpêkirin mafan û yê têkildarî wan ên ku digihîjin heta duçarbûna cudakariyê ya komên kêmdarfet ên wek kal û pîr û jin ên xwediyên nasnameyên etnîkî û zimanî, dertên holê.

Şertê bingehîn ê bidawîhatina binpêkirinan, bidawîkirina rejîma yekzimanî ye. Di vê çarçoveyê de dewlet wek pêdiviya berpirsiyariyên xwe yê neyînî divê li pêşya ku her kes bi awayekî azad bikare zimanê xwe yê dayikê bi kar bîne, nebe asteng û wek pêdiviya berpirsiyariyên xwe yê pozîtîf jî di serî de qadên jiyani yê wek perwerdehî û tenduristiyê, divê di hemû qadên jiyane de ziman bi awayekî kartêker bê bikaranîn, şert û mercên guncaw pêk bîne.

Dema ku nêzikatiya dewletê ya li hemberê mafên ziman û tenduristiyê li ber çavan tê girtin, tê dîtin ku civaka sîvîl û çalakger zêdetir di bin barekî giran de ne. Lê dîsa jî derdikeve holê ku divê têkoşîna ziman bi awayekî durehendî (siyasî û civakî) bê meşandin. Li dera ku tevahiya hewlê ji bo têkoşîna siyasî tê dayîn, qada civakî vala tê hiştin û xebatên li qadê kêmdimînin. Ji ber vê yekê, ji bo xebatên qada sîvîl, pêkanîna yekîtiya termînolojiyê û otorîteyê wek pêdiviya herî lezgîn tê dîtin.

Çalakiyên ku SCS li dar dixin aşkere ye ku ji bo têkoşîna ziman xwediyê kartêkirinekên girîng in. Lê ji ber ku ev çalakî bi piranî li hinek qad an jî li hinek herêmên diyar tên lidarxistin, tenê beşeke civakê dikare xwe bigihîne. Di vê çarçoveyê de xwegihandina civaka sîvîl a kal û pîran û jinan pir girîng e. Ji bo van kesan bi zimanê wan dayîna perwerdehiya bingehîn a têkildarî alîkariya destpêkê, pençeşêra pêşîrê û teşxîskirina pêşwext a hinek nexweşînan hem ji aliyê zimanî ve û hem jî ji aliyê tenduristiyê ve dê bibe sedema pêşketinên girîng.

Çavkanî

- Akad, Mehmet, ve Abdullah Dinçkol. 2007. *1982 Anayasası ve Anayasa Mahkemesi Kararları*. İstanbul: Der.
- Bülbül, İsrail, ve Mikail Bülbül. 2009. *Kürtçe Anamnez-Anamneza bi Kurmancî*. Düzenleyen: Adem Avcıkıran. Diyarbakır: Diyarbakır Tabip Odası.
- Bektaş, Hüseyin. 2004. *Anatomîya Bedena Mirovan*. İstanbul: Deng.
- Dede, Savaş. 2020. *Çocuk ve Dil Hakları Raporu*. Diyarbakır : Önce Çocuklar Derneği.
- Ertan, İzzet Mert. 2012. «*Ulusalüstü İnsan Hakları Hukukunda Sağlık Hakkı ve Etkinleştirilmesi*.» İ.Ü. Sosyal Bilimler Enstitüsü: Teza doxtorayê ya ku nehatî weşandin.
- Fıdan, Omer. 2020. *Wek Hêmeya Bingehîn a Çandê Zımanê Dayikê û Bikaranîna Wî* [Kültürün Temel Ögesi Olarak Anadili ve Onun Kullanımı]. Amed : Komelaye Berî Her Tîştî Zarok.
- Fişek, Nusret. «*Halk Sağlığında Terim Kargaşası Bir Sorun mudur?*» *Türk Tabipleri Birliği Resmi Web Sayfası*. Hat dîtin: 12 01, 2020. https://www.ttb.org.tr/n_fisek/kitap_3/33.html
- Garfinkel, Harold. 1967. *Studies in Ethnomethodology*. New Jersey: Prentice-Hall.
- Izsák-Ndiaye, Rita. 2017. *Dilsel Azınlıkların Dil Hakları, Pratik Uygulama Rehberi*. Cenevre: Birleşmiş Milletler İnsan Hakları Yüksek Komiserliği.
- Man, Jonathan M., Lawrence Gostin, Sofia Gruskin, Troyen Brennan, Zita Lazzarini, ve Harvey V. Fineberg. 1994. «*Health and Human Rights*.» *Health and Human Rights 1 (1)*: 6-23.
- Nygren-Krug, Helena. 2007/2002. *Sağlık ve İnsan Hakları Üzerine 25 Soru - 25 Cevap*. Çeviren Nazmi Zengin. Cenevre: Dünya Sağlık Örgütü/Toplum Sağlığı Araştırma ve Geliştirme Merkezi Derneği.
- Rawest Araştırma. 2020. «*Ebeveyn ve Çocuk Arasında Anadilin Durumu*.» Rawest Araştırma. Hat dîtin: 2020 12. https://rawest.com.tr/wp-content/uploads/2020/02/Ebeveyn_Ana_Dil_Arastirmasi.pdf.
- Simmel, Georg. 2009. *Sociology Inquiries into the Construction of Social Forms*. Çeviren Anthony J. Blasi, Anton K. Jacobs ve Mathew Kanjirathinkal. Boston: Brill.
- Sîpan, Erdal. 2019. *Alîkariya Destpêkê*. Wan: Sîtav.
- T.C. Sağlık Bakanlığı. 2019. *2019-2023 Stratejik Planı*. T.C. Sağlık Bakanlığı.
- Türk Tabipleri Birliği. 2020. «*Dr. Şeyhmus Gökalp tutuklandı: İyi hekimlik değerlerini savunmak suç değildir!*» *TTB Resmi Web Sayfası*. 04 11. Hat dîtin: 11 25, 2020. https://www.ttb.org.tr/haber_goster.php?Guid=f9c91b3a-2e1c-11eb-ae8b-076e13122378.
- Tezcan, Durmuş, Mustafa Ruhan Erdem, Oğuz Sancaktar, ve Rifat Murat Önok. 2018. *İnsan Hakları El Kitabı*. Ankara: Seçkin.
- Türk Tabipleri Birliği. «*Savaş Bir Halk Sağlığı Sorunudur?*» *Türk Tabipleri Birliği Resmi Web Sayfası*. Hat dîtin: 12 01, 2020. https://www.ttb.org.tr/haber_goster.php?Guid=28de85da-00e5-11e8-a05f-429c499923e4
- United Nations. 1948. *Universal Declaration of Human Rights, article: 25*.
- World Health Organisation. 1948. *Constitution Of The World Health Organization, Preamble*.
- . 2005. *International Health Regulations*. Geneva: WHO Press.
- Yıldırım, Engin, ve Serdar Gülener. 2018. «*Anayasa Mahkemesi Kararlarında Uluslararası ve Karşılaştırmalı hukuka Yapılan Atıflar: Ampirik Bir Analiz*.» *Ankara Üniversitesi Hukuk Fakültesi Dergisi 67 (1)*: 105-144.



Web: www.torakurdi.org
E-mail: info@torakurdi.org